



2018 - The Year of ITI



Ram Gobal Bajaj

Hindistan

Nameya Roja Şano ya cîhanî 2018 Asya û Zerya Asa,
Rêvebirê Şanoyê, lîstikvanê Sînemê û Şanoyê, zanistvan, rêvebirê berê yê
dibistana netewî ya dirama yê, Delhî.

Li paş hemî çîrokên pêşkeftinan, em yektiştî tenê dizanin bi kurtî; hemî
rengên jîyanê mêldariya sax mabûna bê dawî li jîyanê dîkin. Û dema ku
jiyana rastî dirêj bibe û bighêje paş çax û deverê da bibe sermedî. Ev
rengê han ji buyeran rengê jîyanê kirêt dike û xwe jî li cîhanê di rûxîne.
Tevî wê jî pêdiviya me bi gotûbêjê heye ji bo mana mirovayetiya û
rizgarkirina wê ji zîlamê şikeftê nêçîvanê Serdema Kevirî ta bi Serdema
mey Asîmanî. Gelo em niha berçavgirin? Hestiyarin? Dilşadin? Gelo
vînahiya me ji surîştta ku em jê çêbûne bihtir e?

Ji destpêka meve, hunerên sax û bi nirx (Dîlan, Mozîk, Lîstikvanî,
Drama) tev niha xwedî zîmanekî li pêşin, ew ji tîpên dengdar û yên
dengdêr pêk tên, yên dengdar tîkiliyên navbera reng û raman pêk tîne û
yên dengdêr girêdayî hest, dilovaniya û zanistiyê ne.
Jîmariyê, Endezyariyê, Çek û anuha kompyûter, tev ji encamên wê bûn.
Lewre em niha nikarin xwe ji vê pêşketina zîman bidin alî. Zemîn bi xwe
jî nikare sax bimîne eger xweşiya giştî ya jîyanê, hunerên şanoyî û zanistî
(li gel teknolojiyê) rizgar nebin, û xwe dûrî biserveçûnê, torebûn,
çavbirçîbûn û nebaşiyê ne kin.

Alavên ragihandinê li ba me zanyarî û teknelocya me wekî Ehrîmanan
xurt kirin. Wisa tê xuyan ku pîrsgirêk ne di rengê Şano de ye lê belê kêşe
di naverok, zelalî û diltengiyê de ye. Îro pêwîstiya me bi bangewaziya
mêrê zemîne heye da Exterê, û herwisa “Şano” jî rizgar bike. Di riya
bikaranînê de pêwîste huner pêşberî lîstikvanan bibe herweha huner a
zarokên ku hîn di pileya xwendin a sereke dene. Ez bawerim ku ev nîfş
hestiyar tire ji bo dilsoziya bi siruşt û jîyanê ve. Wisa di be ku ziyana
taybetmendiyê zimên li ser zemîna Dayik û exterên din jî kêmtir be.
Bihtir ji vê yekê jî Şano dikare di heman demê de girîngtir ji bo
parastina jîyanê û hebûnê .

Lewre ew gerekî pêkanîna rasteqîne li hember bîneran e, bêy kesek fişarê
li yê din bike di vê serdema hevş de.

Ez bi Şano dilxweşim û banga min ji bo cîhanê ku alîkar be ji bo
parastina asta vê binyadê bi giştî çî li ladê yan li rexên şaredariyan, û pêk
ve bi dilovanî nifşan bidin xwendin.

Werger ji Ingilîzî

Lawîn Şêxo

Koma Şano/ Qamişlo